

## Derbarê fetrûmekirina li dijî nexweşiya Zonayê (Herpes zoster, Zoster) – bi Fetrûma neçalak a Jêryekine (Nû-pêkhatî)

Zona (Zoster) zoxaveke li ser çerm a gellek bi êş e û li hin cihan çêdibe ku ji aliyê Vîrûsa 'Varicella-Zoster-Virus' va pêk tê, yanî heman vîrûsa ku hokara nexweşiya Mîrkutikê (varicella) ye. Li Almanyayê li gorî texmîna teqrîbî her salê 300000 kes tûşî vê nexweşiyê dibin û ev pêvajoyê ber bi zêdebûnê va ye.

Zoster tenê di wan kesan da xuya dibe ku pêştir bi nexweşiya Mîrkutikê jî ketibin. Yekem têkilliya di jiyandê da digel Vîrûsa 'Varicella-Zoster' (VZV) dibe sebeba nexweşiya Mîrkutikê ku di hinek babetan da renga pêvajoyeke ne-hestkirî jî hebe. Dema ku nexweşiya Mîrkutikê baş dibe, hejmareke vîrûsan di glockên erebî (ganglia) ya Hezarmorîk û mejî da dimînin. Ewna dikarin li wir bêyî pêkanîna nîşaneyên nexweşiyê di tevahiya emrê mirov da bimînin. Bi zêdebûna temen, nemaze li nav kesên zêdetirî 50 salî û li nav kesên bi pergala ewlehiyê ya lawazbûyî (her wiha di encama bikaranîna dermanan da) renga ev vîrûs careke din çalak bibin. Di vê rewşê da çalakkûna dubare ya Vîrûsa VZV di cihê dabînkirina esebê yê têkildar dibe sebeba diyarbûna nîşaneyên asayî yê nexweşiya Zosterê: Hesrîten nexweş û ne-asayî yê bedenê, sorbûna çerm, pêkhatina pîfîleyê (avlik) li cihekî û pirranî êşên giran ku çêbibin. Di gellek babetan da beden an rû û bi giştî tenê aliyekî leş an rû ev nîşane têda xuya dibin. Navê Zonayê (shingles) ji tûşbûna hin eseb û nerûnan pêk tê ku ji Hezarmorîkê radibin û bi awayê kemberekê (nîvek) dora leşî dialin.

Zona jixwe ji kesekî venaguheze kesek din, helbet renga kesên nexweş van vîrûsan bo kesên ku jibo nexweşiyê amade ne (ne-ewleh) veguhezînin, wek mînak bi riya Bavkal û Dapîrê bo neviyan ku di vê rewşê da ewna tûşî Mîrkutikê dibin. Veguhezîna nexweşiyê tenê ji ber tûşbûna bi riya lewitîna bi materyala nav avlikê pêkan e, ne ku bi riya kuxîn û pişkînê.

Zona pirranî di temenê zêde da xuya dibe. Di cihê dabînkirina eseba têkildar li ser çerm hin avlik çêdibin ku piştra hişk dibin û dibin çermekî zixim. Êşên li cihê esebê renga bi salan berdewam bin (êşa esebî piştî Zosterê). Ji billî pîrsgirêkên ihtimalî ji wan Şelbûn an Kêmgirtinên Bakteriyayî di cihên çermî yê tûşbûyî bi Zosterê, di kêmtir babetan da nîgeraniya ji hawkirinên Hezarmorîkê, Menejîtan an hawkirinên mejî jî pêkan e. Heke esebên li ser rûyê meriv tûşî vîrûsê bibin, renga hin hawkirin li çêv bi mijûlbûnaeseba dîtbariyê, nakokiyên Bihîstinê an Hevsengiyê an şelbûna esebên rû biqewime. Di hinek babetan da renga Zoster heta cihên esebî yê kêlekê û di hin babetên gellek kêmdîtî da heta li seranserî leşî berfireh bibe (Zoster generalisatus).

Gerçî hin derman hene ku renga bibin sebeba lezandina dermanê rûyê çerm, lê li gorî derdên esebî yê mayî, bijardeyên dermên kêmtir in. Fetrûmekirina li dijî Zonayê jibo parastina li hemberî nexweşiya Zosterê û qewimîna rewşên êşên demdirêj (êşa esebî ya piştî herpetische'ê (PHN)) alîkar e.

### Fetrûm

Fetrûma ne-çalak a Zosterê bi riya teknolojiya DNA'a nû-pêkhateyî tê berhemanîn. Ev Fetrûme pêkhatî ji Proteîna bibandor di berteka ewlehiyê û wergirtî ji madeya cenetîkî ya hokara nexweşiyê ye ku girêdayî bi xurtkerêke bandora (adjuvant) ye. Fetrûm li nav masûlkeyê û bi awayekî vebijartî li nav baskê jorîn tê derzîkirin (Fetrûmekirina Masûlkeyî). Fetrûma ne-çalak a li dijî Zonayê jibo kesên zêde ji 50 salî rêpêdayî ye.

Ev fetrûme hevdem dikare digel Fetrûma ne-açalkbûyî ya Flûyê, Fetrûma Pnomokoka 23 kapasîteyî hevrê digel fetrûma hevrê li dijî nexweşiya Kuzaz, Dîfterî û Kuxikreşê – di cihên cuda û cîyawaz ên leşî (baskê jorîn ê rast û çepê) bîn lîxistin. Derbarê fetrûmekirina hevdem digel fetrûmeyên din hîn ti tecrubeyek tune ye.

### Çi kes divê bîn fetrûmekirin?

Komîsiyona Hertimî ya Fetrûmekirinê (STIKO) pêkanîna fetrûmekirinê di babetên jêrê da pêşniyar dike

- wek fetrûmekirina standard jibo hemî kesên zêdetir ji 60 salî
- her wiha jibo kesên 50 salî û zêdetirli ber xetera têkildarî tendurustiyê ya zêdebûyî ji ber nexweşiyêke demdirêj weke:
  - nexweşên bi nakokiya pergala ewlehiya leşî Zikmakî, wergirtî ji Dêbavan an ji ber bikaranîna dermanan
  - tûşbûşna bi HIV'yê
  - 'rheumatoider Arthritis' anjî 'systemischer Lupus erythematodes'
  - nexweşiyên hawkirinê yê demdirêj ên rîviyan
  - nexweşiyên dermdirêj ên gurçikan
  - nexweşiyên pişikê: Nexweşiya asêbûna demdirêj a pişikê (COPD) anku Asma (Asêbûna Nefeskişandinê)
  - nexweşiya Şekirê (Diyabêt).

Fetrûm du caran bi navbira herîkê 2 mehî, helbet piştî 6 mehan tê lîxistin. Parêzbandiya bi riya fetrûmekirinê derdora 4 hefteyan piştî doza Duyem tê çaverêkirin. Di dema niha da diyar nîne ku gelo piştre yanî piştî çend salan dozeke din pêwîst e an na.

### Çi kes nabe ku bîn fetrûmekirinê?

Di nexweşiya xedar a hevrê digel Tayê (Zêdetir ji 38,5 °C) da ku hewcetî bi dermên heye, divê Fetrûmekirin paşda bikeve. Kesên ku li hemberî pişkeke fetrûmeyê hestyar in, nabe ku bîn fetrûmekirin. Di babetên istîsna da bijîşk dê te agah bike.

Tecrube û ezmûnek derbarê destûrdana fetrûma Zosterê jibo jinên Ducanî (Hamile) an jinên şîr didin tune ye, ji ber vê yekê divê jibo baldarî Fetrûmekirin li ser wan neyê kirin (Fetrûme tenê ji temenê 50 salî û jortir rêpêdayî ye).

Fetrûmekirin derbarê kesên ku di wan da nexweşiya Zosterê xuya bûye, nayê pêşniyarkirin. Her wiha dermanê hawkirinê esebî yê Zosterê bi riya Fetrûmekirinê ne pêkan e. Helbet heke pêwîst bike, meriv dikare fetrûmekirinê di demeke din û di pêşerojê da cih bîne. Bijîşkê te dikare di vî warî da rawêjkariyê raberî te bike.

### **Tevgeriyana piştî Fetrûmekirinê**

Kesê Fetrûmekirî hewceî bi lêmiqatebûneke taybet tune, lê di heyama 3 rojan piştî fetrûmekirinê divê zêde zexta leşî neyne ser xwe. Derbarê kesên ku pergala geriyana xwîna wan hestiyar e an di wan da hestiyariyên bilez xuya bûne, divê beriya Fetrûmekirinê di vî warî da bijîşk were haydarkirin. Ji ber qewimîna carcarî ya êrîşên Jixweçûnê, divê Fetrûmekirin heke pêwîst e di haleta razayî li ser erdê pêk were.

### **Bertekên giştî û nuqteyî yê ihtimalî piştî Fetrûmekirinê**

Piştî fetrûmekirinê rege ji billî parêzbendîya çaverêkirî û di encamê da parastina li hemberî nexweşiyê di kesên fetrûmekirî da, li cihê têrekirina fetrûmeyê di gellek babetan da (sedî 10 an zêdetir ji kesên Fetrûmekirî) sorbûna demkî an werimîna bi êş û reqbûn û hesta germayê pêk were. Ev nîşana tûşbûna asayî ya leşî digel Fetrûmeyê ye. Ji billî vêya rege di cihê têrekirina fetrûmeyê da xurîn çê bibe (derdora sedî 1 heta 20), carina (sedî 0.1 heta sedî 1) kîsikên 'Lymphknoten' yê kêleke diperçifin (diwerimin). Di gellek babetan da êşên masûlkeyan û serêş, westiyar, Ta û hejîn û kêşeyên mîde û rîviyan (hesta Dilrabûn û Vereşîn, Dilêş) tîr ragihandin. Heke hevdem Fetrûmeyê Pnomokok (pneumococcal vaccine) a 23 Kapasîteyî were fetrûmekirin, dê qewimîna Ta û hejê zêdetir gengaz e. Carina êşên masûlkeyan çêdibin. Carina Jixweçûn derdem piştî (an heta beriya) Fetrûmekirinê wek bertekê derûnî û rewanî bo têrekirina derzî li nav çermê diqewimin ku ev êrîş rege di qonaxa hatina ser hiş bi awayê ddemkî nakokiyên dîtbariyê, hestên nebaş û ne-asayî yê leşî an tevgerên bê-hemdê-xwe pêk bînin (Seredana "Tevgeriyana piştî Fetrûmekirinê" jî bike).

Bi giştî bertekên navbirî demkî ne û bilez û bûyî dûhatên din ji nav diçin.

### **Gelo pirsgirêkên Fetrûmekirinê rege biqewimin?**

Pirsgirêkên Fetrûmekirinê dûhatên gellek kêmdîtî û joratir ji asta normal a berteka li dijî Fetrûmekirinê ne ku bi aşkiratî derbeyê li tendurustiya kesê Fetrûmekirî dixin. Piştî fetrûmekirina Zosterê Nû-pêkhatayî kêmtir dûhatên çermî yê di têkiliya demî digel Fetrûmekirinê, her wiha bertekên Alerjîk, ji wan Bêhişbûna çermî an Sorbûn xuya bû. Weke hemî babetên din ên Fetrûmekirinê, rege piştî têrekirina vê fetrûmeyê di hin babetên kêmdîtî da ji bertekên bilez ên Alerjîk bigir heta Şokebûn û behicînê gengaz bin.

### **Şewirîn derbarê dûhatên Fetrûmekirinê yê gengaz digel Bijîşkê Fetrûmekir**

Di tijîkirina vê belgeya rênîşander da, bijîşkê te dê civîneke şirovekirin û têgihandinê jibo te dayne.

Heke piştî fetrûmekirinê hin nîşane xuya bibin ku wêdatir ji bertekên nuqteyî û giştî yê hilêxistî li jorê bin ku bilez ji nav diçin, xuya ye ku bijîşkê fetrûmekir jibo Şewirînê jî di zîmeta te da ye.

Tu bi vî awayî di têkiliya digel bijîşkê Fetrûmekir da yî:

## Belgeya Razîbûnê

### Jibo pêkanîna Fetrûmekirina li dijî nexweşiya Zonayê (Zoster) – Bi Fetrûma neçalak

(Hin form jî hevrê digel kopyaya wê bi mebesta radestkirina versiyona Kopya bo kesê fetrûmêbûyî an kesên xwedan mafê sergêriya wî/ê li gorî Qanûna Nexweşan li ber dest in.)

Navê kesê/a Fetrûmekirî \_\_\_\_\_

roja Jidayîkbûnê \_\_\_\_\_

Min naveroka belgeya rêber dîtiye û ez ji aliyê bijîşkê xwe va li civîna gotûbêjê bi awayekî hûr û kûr derbarê Fetrûmekirinê hatime haydarkirin.

- Min êdî pirseke din tune.
- Ez razîbûna xwe derbarê Fetrûmekirina pêşniyarkirî li dijî Zonayê bi Fetrûmeya neçalak radigihînim.
- Ez dijayetiya xwe derbarê Fetrûmekirina pêşniyarkirî radigihînim. Ez derbaerê dûhatên gengaz ên dijayetiya bi vê fetrûmekirinê hatim haydarkirin.

Şirove: \_\_\_\_\_

Cih, Roj: \_\_\_\_\_

\_\_\_\_\_

Îmzeya kesê/a fetrûmekirî

\_\_\_\_\_

Îmzeya Bijîşk

### Rakirina berpirsiyariyê

Versiyona sereke (06/2018) ya vê belgeya agahiyan jibo enstîtûya Robert Koch bi wergirtina inzê ji Deutsches Grünes Kreuz e.V hatiye wergerandin. Nivîsa Almanî jêderka pêbawer e; Tu berpirsiyariyek jibo her cûre şaşitiya wergerandinê an jibo têkilliya bi wergerandina niha li gorî venihêrîna pêşerojê ya versiyona sereke ya zimanê almanî nayê pejirandin.

Nav

Fetrûmekirin  
li dijî Nexweşiya Zonayê  
– bi fetrûma ne-çalak

**Beriya pêkanîna Fetrûmekirinê lêzanînên jêrê jibo tijîkirinê tên xwestin:**

1. Gelo kesê/a ku divê were fetrûmekirin di dema niha da tendurust e?

Erê  Na

2. Gelo di kesê/a ku divê were fetrûmekirin, hestyarî hatiye pêderxistin?

Erê  Na

heke erê, çi hestiyariyek? \_\_\_\_\_

3. Gelo di kesê/a ku divê were fetrûmekirin, piştî fetrûmekirina cara pêşî nîşaneyên Alerjîk, taya zêde an bertekên ne-asayî yên din xuya bûn?

Erê  Na

Heke dixwazî derbarê fetrûmekirina li dijî nexweşiya Zonayê pirtir bizanî, ji Bijîşkê Fetrûmekir bipirse!

*Ji kerema xwe di dema Fetrûmekirinê da, lénivîsa xwe ya Fetrûmekirinê jî digel xwe bîne!*